

Bernhard-Weiß-Str. 6  
10178 Berlin-

Mitte U+ S Alexander

platz

[www.berlin.de/sen/bjf](http://www.berlin.de/sen/bjf)

Senatsverwaltung für Bildung, Jugend und Familie ■ Bernhard-Weiß-Str. 6 ■ D-10178 Berlin

## **Ji bo dêûbavên, zarokên wan diçin kreşên Berlinê**

01.04.2021

### **Jinûvegirtin ahêlînên zarokan ên danê rojê û sazîyên lînêrîna zarokan a danê rojê**

#### **- Agahiyên ji bo dêûbavan ên li ser xebata acîl a piştî 8ê Nîsana 2021an**

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

Ji ber bûyerên enfeksiyonê yên her bêhtir dibin, ku di nav wan de cûreya vîrusa koronayê (B.1.1.7) her xurttir dibe, Senatoya Berlinê di civîna xwe ya taybet a îro de biryar stand, ku hêlîn û sazîyên lînêrîna zarokan a danê rojê ji nû ve werin girtin û her wisa dîsa li xebata acîl were vegeştin. Ev rêbaz piştî 08.04.2021an derbas dibe. Bi vî awayî divê hejmara enfeksiyonên nû were kêmkirin û pêşî lê were girtin, ku pergala tenduristiyê nekeve bin bareke giran.

Mîrov dikare ji lînêrîna acîl hingê sûdê bigire, gava

- pêdiviyêke awarte û acîl a lînêrîna zarokan hebe û derfeteke di lînêrîna tune be

#### **- û di heman demê de**

- karê pêşeyî yê ek ji dayik û bavî (her wisa di Homeoffice'ê de) di lîsteya nû ya ji bo lînêrîna acîl a hêlîna zarokan de nivîsandî be. Ev lîste li ser vê derê xuya dibe <https://www.berlin.de/sen/bjf/corona/schule/uebersicht-der-berufsgruppen-fuer-die-notbetreuung.pdf>

- zarok herin pêşdibistanê(angozarokên,ku havînê dê derbasî dibistanê bibin)yan jîev zarok, zarokên dayik an jî bavên tenê bin,bêyî ku karê pîşeyî yê van dêûbavan angoberpirsyarên qanûnî li ber çavan were girtin, an jî
- lênêrîna van zarokan ji ber sedemên pedagojîk ên taybet û acîl pêwîst be.Di vê çarçoweyê de zarokên di astengiyê de angozarokên bi astengî, zarokên pêdiviya wanbi piştgiriya zimanî heye û her wisa bûyerên parastina zarokan cî digirin.Her wisabêyî ku karê pîşeyî yê dêûbav angoberpirsyarên qanûnîyên van zarokan li ber çavan were girtin,ev zarok ji mafê lînêrînê sûdê digirin.

Sedema pêdiviyeke awarte û acîl a lînêrîna zarokan dikare ji ber kar an jî şexsî be.Dibe ku ev yek pêdiviyeke tenê ji bo rojekê be yan jî pêdiviyeke berdewamî yan jîbi rêkûpêk be.

Dîsa jî em ji tevahiya van dêûbav ango berpirsyarên qanûnî dixwazin, kuzarokên wan xwedî mafê lînêrînê ne,di mijara pêdiviya lînêrînê ya şexsî de tenê bi qasî ku teqez pêwîst e,ewqas sûdê ji vî mafî bigirin û bi rêkûpêkî li gel navendên hêlînên xwe biaxivin.

Ji kerema xwe re bila di bîra we de be, ku zarokên xwedî nîşaneyên sivik ên nexweşiyê jî, wekî zekemîketin an jî kuxînê, niha bêyî encameke negatîv a testê nikarin sûdê ji lînêrînê bigirin.Rêbazên di derbarê nêzîkatiya bi zarokên xwedî nîşaneyên nexweşiyê de, kudi nivîsa ji 31.03.2021an a agahiya dêûbavan de diyarkirî ne, hêj jî bi berdewamî derbas dibin.

#### Mesrefên xwarin û vexwarinê:

Ji ber ku xebata acîl a lînêrînê careke din pêk tê û bi vê yekê re jî ji dêûbavanre ji ber vê sedemê astengî derdikevin û zehmetiyênwan çêdibin, me ji saziyên hêlînan rica kir, ku piştî meha Nîsanê, gava zarok di mehekê de bêhtirî 10 rojan ji xizmeta lînêrînê sûdê negirin, hingê heqê mesrefa xwarin û vexwarinê ji dêûbavên wan nestînin.Ji ber ku heqê mesrefa xwarin û vexwarinê serê mehê tê standin û di vê demê de bi zelalî ne diyar e,ka zarok dê ji xizmeta lînêrînê çiqas sûdê bigirinû wekî din her wisa nayê zanîn ka pêkan e, ku hesab paşê were kirin.

#### **Dêûbavên hêja,**

SenatoyaBerlinê li ser dixebite, bi qasî ku pêkan e,zû vegere xebata asayî ya astengkirî ya li gorî şertên pandemiyê.Ji bo vê yekê em kampanyaya derziyan a ji bo xebatkarên hêlîn û saziyên lînêrîna zarokan a danê rojê didomînin.Wekî din di hefteyên pêş de ji bo xebatkarên pedagojiyê û her wisa zarokan bêhtir Testkit dê werin amadekirin.Wekî din, tevgerîna li gorî pîvanên paqijiyê bi qasî demên berê, niha jî bingehê girîng e.

Em ji bo xweşbînî û piştgiriya we spasîya we dikin.

Li gel silavên  
germPeywirdar  
HolgerSchulze  
Rêveberê Daîreya

Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk